# سەردەمی نوێ

ڕۆژنامەیەکی سیاسی ـ فەرهەنگی کۆمەڵایەتیە

ساڵی سێیەم    ژمارە ٢٥    ڕێبەندان ـ فوریە ـ ١٩٨٨    نرخی ١٠ کرۆنە


لەم ژمارەیە دا :


- شەڕی ئێران وعێراق و ...
- وتوو ویژێك لەگەڵ د ٠ جەمشید
- نامەیەکی گەیشتوو(کوردۆلۆژی)
- دەسەڵاتی بێ پایان
- کوردستان لە چاپەمەنیەکاندا
- چیرۆکێك
- کۆنگرەی ١٥ی یەکێتی خوێندکارا نی جیهانی
- گۆشەی ئەدەب
- دوا هەواڵ


## دووی ڕێبەندان جێژنی پیرۆزی گەلی کوردە



ڕۆژی هەڵکردنی ئاڵا لە مەهاباد

بەڕاستی ئەم ڕۆژە پیرۆزە بۆ گەلی بن دەست و بەشخوراوی کورد ڕووداوێکی گرنگی مێژوویی و جێژنێکی گەورەیە ٠

لە مێژووی پڕلە کارەسات و خوێناوی، پڕلە گیانفیدایی و قارەمانی نەتەوەکەماندا ، کەم ڕۆژی واهەبوە کە ئاوا بەڕوونی ڕێبازی خەبات و تێکۆشانی میللەت دیاری بکا و ئاوا لاپەڕی مێژوو بڕەنگێنێ ٠ کەم ڕۆژی ئاوا هەبوە کە خەڵك لە بیری نەکا و هەموو ساڵێ کۆمەڵانی زەحمەتکێشی کوردستان یادی بکەنەوە و بۆ لەبیر چوونی داخ و حەسرەت بڕیژن٠

دووی ڕێبەندان سەرەتای مێژووی نوێ و بەرەبەیانی ڕووناکی خەباتی شۆڕشگێڕانەی نەتەوەیەکی کۆڵنەدەر و ئازادیخوازە، کە لە مێژ ساڵە بێوچان و بشوودان بە هەنگاوی ئازایانە، ڕێگای پڕلە مەترسی و پڕ لە هەوراز ونشێو دەپێوێ و لە پێناو ئازادی و ڕزگاری نەتەوایەتی‌دا گیان بەخت دەکا و رادەپەڕێ و دژی داگیرکەر وکۆنەپەرست و ئیمپریالیزم خەبات دەکا ٠

بە خۆشحاڵییەوە نیە کە گەلی کورد لە کوردستانی ئێران، هەموو ساڵێ لە هەموو بار ودۆخێکی دژوار وسەخت دا ، لە ژێر زەبرو زەنگی حکومەتە چەپەڵەکانی پاشایەتی و ئیسلامی‌دا ، ئەم ڕۆژە جێژن دەگرێ و بە هەڵکردنی ئاگر لە سەر دوندی چیابەرزەکان یادی ئەم ڕۆژە پیرۆزە زیندوو دەکاتەوە و هەستی تۆڵە و بەربەرەکانی دە بزوێنێ٠ نیشتمانپەروەرانی کورد، حیزب و ڕێکخراو وچاپەمەنیە پێشکەوتووخوازەکانی کورد لە هەموو بەشەکانی کوردستان و لە دەرەوەی وڵات ،دووی ڕێبەندان بە جێژنی خۆیان دەزانن و ئاهەنگی بۆ دەگێڕن و یادی دەکەنەوە ٠ نەك هەر ئەوە تەنانەت کۆنەپەرستی کوردیش دووی ڕێبەندان دەقۆزێتەوە ودەیکاتە بیانوو بۆ دەربڕینی داخی دڵی دژی هێزە دیموکرات و پێشکەوتووخوازەکان و دژی دۆستی ڕاستەقینەی گەلی کورد یەکێتی سۆڤێتی و وڵاتانی تری سوسیالیستی و بەبێت و باڵۆری دەزگای ڕاگەیاندنی ئیمپریالیزم دژی وڵاتانی سوسیالیستی کاوێژ دەکاتەوە٠

بۆ ل ٢

## دوو ساڵ تێکۆشانی بەردەوام




"سەردەمی نوێ" بە شانازیەوە پێ دەنێتە ساڵی سێیەمی تێکۆشانی و لە ماوەی دووساڵی ڕابردوودا ، لەسەر ڕێبازێکی پێشکەوتووخوازانە، دەنگی دڵسۆزی بزووتنەوەی ڕزگاریخوازی کوردستانی بە دنیا ڕاگەیاندوە ٠ لەوماوەیەدا ٤ ژمار لە وڵاتەکانی ئورووپا و ئەمریکا و چار و. بار لە نیشتمانیش بە ڕێك وپێکی گەیوە. تە دەستی خوێنەرانی بەڕێزەوە٠

سەردەمی نوێ لە باری سیاسی و کولتوری و ئەدەبی و ئیدەئۆلۆژییەوە، وتاری بڵاو کردۆتەوە و لە سەر بار و دۆخی کوردستان دوژمنانی ڕیسوا کردوە و ئاڵای تێ کۆشانی بەرز ڕاگرتوە

بۆ ل ٦

## ٩ ساڵ پاش ڕاپەڕینی گەلانی ئێران

ڕێبەندانی ئەم ساڵ، ٩ساڵ بە سەر ڕاپەڕینی هەراوی گەلانی ئێراندا ڕادە- بڕێ.ڕێژیمی دیکتاتور وسەربە ئیمپریا- لیستی شا، لە چوار چێوەی سیستمی سەرمایەداری پێشکەوتوودا ، دەزگایەکی پۆلیسی و دیکتاتوری ئەوتۆی پێك هێنابوو کە نەی دەتوانی لەوە پاتر ژیانی پڕ لە ناتەبایی و ناکۆکی کۆمەڵایەتی درێژە پێ بدات، دەسەڵات و چاوەدێری دەرباری پەهلەوی، بە پێچەوانەی قانوونی ئەساسی و دیکتاتوری و سەرەڕۆیی خودی شا ،زەحمەت و لەمسگەمەندانی سازمانی ئەمنیەت ،پێ شێل کردنی ماف و هەموو ڕێگۆ شوێنێکی ئازادی و دیموکراسی، لەگەڵ نابەرامبەری و ناتەبایی بێوێنەی ئابووری وکۆمەڵایەتی

بۆ ل ٦

پاشماوەی ل ٤

## چاوپێکەوتنێک لەگەڵ

ڕوناکبیر و خوێنەران ... پێویستە گرنگی بداتە باری زمانی کورد لە ئاوارەییدا و ڕاستکۆ بێ لەگەڵ خەڵکدا. بە بڕوای من ئەو هۆکارانەی ڕۆژنامەگەری کوردی بەرەو بارێکی باشتر دەگوێزنەوە پێویستە ئەو خاڵانە لەبەرچاو بگرن :

ا - جیوازی شێوەی (ڕوخسار)ی ڕۆژنامە و گۆڤار ...

ب - جیاوازی زمانی ڕۆژنامەو گۆڤار ، ڕاستە پێویستە لە هەردوو جۆردا ، بە زمانێکی کوردی پاراو و ڕەوان بنووسرێ ، بەلام زمانی ڕۆژنامە ساکار تربێت ، چونکە ئاراستەی جەماوەر دەکرێت ، نەك دەستەیەك. پێویستە ڕادەی خوێنەواریخەڵك لەبەرچاو بگیرێ .

ج - بابەتی ڕۆژنامە - کورت و خەست کراوە ، دەنگ و باسی ڕۆژانەو گرنگ و ڕووداوەکانی کوردستان و هەڵوێستی ڕوون بەرامبەر بەڕووداوەکان ، بابەتی هەمەچەشنە کە پەیوەندی هەیە بە باری ژیانی جەماوەری ئاوارە و پەنابەندەوە . نووسینی کونکرێت و پڕ فاکت لەسەر باری کوردستان و خەباتی کورد .

د - لە گۆڤاردا پێویستە وتارەکان زۆردرێژ نەبن، بەلام لێکۆڵینەوە و لێکدانەوەیان تێدا هەبێ ( ئەنالیز - تحلیل ) ، بابەتی نوێ و گرنگ کە پێوەندی هەیە بەدوارۆژی کوردو دەبێتە سەرچاوەی لێکۆڵینەوەی فراوان ، بابەتەکە لە قەوارەی تەسکدا نەبێ، واتە نەك تەنیا کوردو کوردستان ، بەڵکو پێویستە فراوان تر بێت .

وەلامی پرسیاری دووەم :

بە بڕوای من ئێمە ئێستا بە سێ شێوە دەنووسین ، ١ لە بارەی ئەلفوبێ ، ٢ لەبارەی زاراوی زمان ... ئەلف و بێی لاتینی ، عەرەبی و کریلێك ( ڕووسی ) . و دیالێکتی کرمانجی خواروو و ژووروو ، و لە سایەی ئامۆژگای کوردی پاریس بەش زاراش هاتۆتە ناو کۆڕی نووسینەوە . بێگومان بوونی سێ جۆرە ئەلف و بێ و سێ شێوە زمان ، بەندە بە باری مێژووی کوردستان لەو سەردەمەدا ، لام وایە تا ئەو ڕۆژەی کورد دەگاتە ئامانجی خۆی ، واتە سەربەخۆیی کوردستان یاخود بوونی دەسەلاتی کوردی لە هەر یەك لە پارچەکانی کوردستان دوو شێوە ئەلف و بێ و دوو شێوە دیالەکت دەمێنێ ، بەلام من بە هیچ جۆرێك بە ڕاستی نازانم بەکارهێنانی ئەلف و بێ ی ڕووسی یاخود زارا بسپێنە زمانی ئەدەبی ، واتە ئێمە بە سێ جۆرە زمان، یاخود ڕاستر بڵێین بە سێ شێوە ئەدەب و نووسین بلاو بکەینەوە . بێگومان ئەو بارەی ئێستا ڕۆژنامەگەری و ئەدەبی کوردی تووشی هاتووە، ئەگەرەیەکی گەورەیە وە لە پێش نزیك بوونەوەی هەردوو دیالێکتە سەرەکییەکەی زمانی کوردیدا ، هەروەها دیوارێکی چیمەنتۆزێر دروست کراوە لە نێوان خوێنەرانی کورد لە هەموو پارچەکاندا . ئەرکی ڕوناکبیر و ڕۆنامەنووس و نووسەرانی کورد لە بواری نزیك کردنەوەی دیالێکتەکان و دۆزینەوە و چەسپاندنی ئەلف و بێ یەك بۆ زمانی کوردی ، ئەرکی ئەورۆ نییە ، ئەوە پەنجا ساڵ پترە هاتۆتە کایەوە ، بەلام تەنیا دەسەلاتی کورد دەتوانێ چارەسەری بکات، بەلام مانای ئەوە نییە ئێمە دەستەوئەژنۆ دابنیشین ، تا من لەو بڕوایەدام پێویستە هەردوولا، هەوڵ بدەین خۆمان فێری شێوە و ئەلف و بێی ئەوی تر بکەین ، نووسینی کرمانجی خوارووش هەندێ جار بە لاتینی بلاوبکەینەوە ...

ئایا ئێوە لەو سەردەمی نوێ دا چیمان کردووە لەم بارەیەوە ؟

لە ژمارەی یەکەمەوە هەوڵمان داوە بە هەردوو دیالێکت و هەردوو ئەلف وبێی بنووسین . بەلام لە بارەی کرمانجی ژووروو وە تووشی زۆر گیروگرفت هاتووین ، چونکە وەك دەزانرێ تا ئێستا کرمانجی ژووروو بەیەك شێوە نانوسرێ، مەبەستم هەر نووسەرێك یا ڕۆژنامەیەك ، بەو شێوەیە دەنووسێ کە لە ناوچەکەی خۆی باوە ، ئەوەش بۆتە هۆی ئەوەی کە هەر یەکێك ئەوی تر بە چەوت لە قەڵەم بدات ، واتە تا ئێستا زمانێکی کرمانجی ژووروو ستاندارد نییە ، بەلام لە کرمانجی خواروو تا ڕادەیەکی زۆر ئەوە چارکراوە ... لە کرمانجی ژووروودا نەك تەنیا لە شێوەدا جیاوازی بەرچاو دەکرێ، بەڵکو لەڕێنووسیشدا ئەوە هەیە .. هەندێکیان سێ ئەلف و بێی جەلادەت بەدرخان بەکاردێنن ، ئەوی تریان یا هی محەممەد ئەمین بۆ زئەرسەلان ، یان ...هتد .

وەلامی پرسیاری چوارەم

"سەردەمی نوێ " وەك لە ژمارەی یەکەمدا نووسراوە ، ڕۆژنامەیەکی پێشکەوتنخوازی کوردییە، سەر بەهیچ هێزێکی سیاسی کوردستان نییە، بەلام پارێزگاری لە گەلی کورد و بەرژەوەندی ڕزگاریخوازی گەلی کورد دەکات ، خەبات دەکات بۆ یەکێتی ڕیزی هێزە نیشتمانپەروەرەکانی کوردستان ، ڕاستی باری بزووتنەوەی کورد بە جەماوەر دەناسێنێ ، تیشك دەخاتە سەر ڕووداوەکانی کوردستان ، دوژمنانی کورد لە وڵاتە داگیرکەرەکانی کوردستان و ئاغاکانیان ، ئیمپریالیزمی جیهانی و داردەستەکانیان ڕیسوا دەکا . بە بڕوای من و برادەرانی دەستەی نووسەران " سەردەمی نوێ " لە ژمارەی یەکەمەوە تا ئێستا کە چوارژمارەی لێ دەرچووە ، ڕێبازی خۆی نەگۆڕیوە و ڕێبازەکەی لە خزمەت بزووتنەوەی ڕزگاریخوازی گەلی کوردا و لە پێناو وەدەستهێنانی مافی دیاریکردنی چارەنووسی گەلی کوردایە .

وەلامی پرسیاری پێنجەم

لە وەلامی یەکەمدا ، ڕێنوێنی زۆر شت کراوە لە بارەی ڕۆژنامە و گۆڤاری کوردی ، وا بزانم گۆڤاری مەلبەندیش دەگرێتەوە ،ئەگەر لەبەرچاو بگیرێ بەرەو پێش دەبا .. هیوادارم دەستەی نووسەرانی مەلبەند سوود لە ئەزموونی ڕۆژنامەگەری کورد وەرگرن، بەڵکو هەنگاوی نوێش بنێن بۆ بەرەو پێش بردنی ڕۆژنامەگەری کوردی *

پاشماوەی ل ٤

## کورد و لۆژی

ئەگەر سیاسیەکی کورد بچێتە لای شارەزا یێکی سایکولوژی و باسی گرێ کوێرەکانی کەسایەتی خۆی بکات، ئەوە باسی وەرعی زمانی خۆی دەکات لە بەرگی ناوی یەکێکی تر !

ڕەنگبێ ئارادسێك ڕوونان بێت پێم بڵێن چێشتەگەت هەر لە چێشتی مجێور دەکا ، بەلام چی بکەم ، منیش کوردێکم لە ناو ئەو کۆمەڵەوە هاتووم، لە ناو ئەو هەموو تەم و مژە هەناسەم وەر گرتوە، لەگەڵ ئەو جۆرە خەبات و کارەساتانە گەلاڵە بوە کە لەوە. تی دەنگ بەرز دەکەینەوە، خوێن بە جل و بەرگی جەستەمانەوە ڕەق دەبێتەوە، وڵاتما ویران دەکرێ، چەوسانەوەو مەترسی لەسەر ژیانمان زیاتر دەبێ، ئینجا دەبێ ئەم ماستە چ موویێکی تێدا نەبێ؟ بەڵێ ئەوەك هەر مووی تێدایە و بگرە چەندان ڕابەڵێی ئەم دەست و ئەو دەستی تێدا ڕابەڵکراوە بە جۆرێك وەك سنجەقی ماستەکە، تەنیا هەر بخناو ، ناوی " هەولێری" بە سەرەوە بە، دەنا فری بە سەر هەولێرەوە نیە .

ئەو سەرە پەتانەش کە دوژمنانی سەرەکی دوێنێ و ئەمڕۆ و بە بالی گەلەکەمان بە دەستی خۆمان و لە بەرگی کوردیدا بخناو هەناوی گەلی کورد نێبەرنراوە ...

ئەو جار ئەگەر ئێوە لە پێشەوە دەرفەتی ئەمەن و بواری ژیان، ڕێگام پێبدەن، بۆ لەمەودوا ئەمەو ئەوی تر دەخەمە سەر کاغەز پێشکەشی هەموو لایەکی دەکەم..

هەموو کار و پرۆژەیەکیش ، بێ گوێ دانە بچوکی و گەورەیی، بە سەرە تاوە دەست پێ دەکا ، ئەگەر وەستاو کەرستەکانی هاوتای یەکتری بن، ئەنجامێکی سەرکەوتوانە دەدەن بە دەستەوە . *

پاشماوەی ل ٢

# شەڕی ئێران و عیراق و

فەرمان دراوە بە لەشکری عیراق لە کوردستان کە هەر زیندەوارێکی لەو ناوچانە دا واتە (لە کوردستان) ببینرێ ئادەمیزاد یا حەیوان، چەکدار یا بێ چەك، بێ دەنگ دان و پرسی و را، دەست ڕێژ ی لێ بکرێ و بکوژرێ. بومبارانی کیمیاوی، ئیعدامی بە کۆمەل، گواستنەوە و چۆل کردنی گوندەکان، لای هەمووتان ئاشکرا، بە و پێویستی بە دووبارە کردنەوەنیە.

چاوەڕوانی ئەوە دەکرا کە هێزە سیاسیەکانی کوردستان لە سەرەتای ساز، بوونی شەڕی ئێران و عیراق ناکۆکی و دووبەرەکی نێو خۆیان وەلابنێن و لەم قوناخەدا ستراتیژی و سیاسەتێکی یەکگرتوو بگرنە پێش. دوژمنایەتی دووڕێژیمی داگیرکەر ببێتە هۆی دۆستایەتی و یەك گرتنی هێزەکانی کوردستان.

بەلام بەداخەوە هێزەکانی مەیدانی خەباتی کوردستان لە ئێران و عیراق نەك هەر نەیانتوانی خەبات و سیاسەتی خۆیان بکەنە یەك، بەلکوو هەر یەك پالیان وە حکوومەتێکی داگیر کەرداو نێوان ناخۆشی هێزەکانی کوردستانی خواروو، تەشنەی کردە کوردستانی ئێرانیش و لەوێش شەڕی براکوژی سازکراو دوژمن کەلکی لێ وەرگرت.

دەکرێ بەراشکاوی بلێین بە داخەوە گەلی کورد لە شەڕی نێوان دوو حکوومەتی دژ بە کورد نەك هەر نەی توانی و یا بۆی نەلوا کەلك وەربگری، بەلکوو بوو بە گوشتی دەمی توپ و نیشتمانی ویران کرا و دوژمن کەلکی لێ وەرگرت.

هەنگاوێکی ئێستا لە کوردستانی خواروو بۆ ئاشت بوونەوە و پێك هێنانی بەرەیەکی کوردستانی هاوێژراوە، جێگای هومێد و بێ خۆشبوونی هەموو نیشتمان- پەروەرێکی کورد و ئەشێ پشتیوانی لێ بکرێ.

بە تایبەت کە دەیانەوێ بیکەن بە بەرەیەکی بەرینی سەرانسەری عیراق و گشت هێزە- دیموکراتیەکانی دژ بە حکوومەتی عیراق بگرێتەوە.

بۆ چی بێ لە سەر ئەو (تایبەتیە) دادە- گرم؟ چونکە ئاڵیکردنەوەی خەباتی گەلان و خەباتی گەلی کوردیش بە جوانی دەری خستوە کە بە بێ بەرەیەکی بەرینی پێشکەوتنخواز سەرکەوتنی خەبات بەسەر دوژمن زۆر دار دا، دژوارە.

**هێندی هەلوێستی جیاواز لە سەر وەستانی شەڕی ئێران و عیراق.**

باسی هەلوێستی حکوومەتەکانی دەرەوە- مان کرد، لە نێو هێزە دیموکراتیەکانی ولاتیش دا بۆ چوونی جیاواز لە سەر وەستانی شەڕ دەبینرێ. هێندی لە هێزە دیموکراتیەکانی ئەم دوو ولاتە دروشمی وەستانی شەڕ دەخەنە پێش و لایان وایە وەستانی شەڕ دەبێتە هۆی ئێران و ئالوزی نێو حکوومەت و دەرەتانی خەباتی ئیلگیرتر بۆ رووخاندنی ئەو ڕێژیمە دیکتاتورانە پێك دێنێ، بە تایبەت کە ئەو دروشمە پشتیوانی هێزە دیموکراتەکانی جیهانیش پتر رادەکێشێ.

هێندێکی تر لە هێزە دیموکراتەکان بە تایبەت هێزە دیموکراتیەکانی کوردستانی عیراق لەو کاتە دا کە ئەوا- نیش دروشمی وەستانی شەڕیان هەیە، بەلام رووخانی ڕێژیمی دیکتاتوری سەددام وەپێش وەستانی شەڕە دەخەن. بەلگەشیان ئەوەیە کە حکوومەتی سەددام ئەگەر بەو شەڕە نەرووخی، واتە بە ڕێژیمی کۆماری ئیسلامی نەرووخی، ئیتر خۆ دەگرێ و کەس دەروێشی نایە و بەجارێك سەقام گرتوو دەبێ و ئیتر هەموو بەرهەلست و جولانەوەیەك سەرکوت دەکا.

بە دیتنی من چەند کەم و کوڕیەك، چەند کورت بینی یەك لەم بۆ چوونەدا هەیە.

١- ئەزموونی شەڕی ٧ سالە نیشانی داوە کە ڕێژیمی عیراق بە شەڕ ناڕوخێ، یان بە واتەیەکی تر، ناهێلێن بڕووخێ. هەر- چەند شەڕ لە نێوان ئێران و عیراق دایە، بەلام ناگری هەلوێست و سیاسەتی دەولەتە مەزنەکانی جیهانیش لەم بوارە دا لەبەر چاو نەگیرێ.

رووخانی حکوومەتی عیراق لە ڕێگای شەڕەوە، واتە سەرکەوتنی حکوومەتی ئیسلامی ئێران بە سەر عیراق دا بە قازا- نجی هیچ یەك لە دەولەتە مەزنەکان نیەو مەترسیەکی راستەو خۆشە بۆ ولاتانی عەرەبی رۆژهەلاتی نێوە راست و ناوچەی کەنداوی خەلیج.

٢- ڕەنگە ئەم هێزانە لایان وابێ بە رووخانی ڕێژیمی سەددام، مەسەلەی دیموکراسی و مافی نەتەوایەتی میللەتی کورد چارەسەر و دابین دەکرێ.

لە کاتێکا روون و ئاشکرایە ئەگەر حکوومەتی ئێران ڕێژیمی سەددام بڕووخێنێ حکوومەتێکی وێنەی خۆی لە عیراق دادەمەزرێنێ و هەر لە ئێستاوە ئاخوندی عیراقی لە "مەجلیسی ئەعلای عیراق" دا کۆ کردوونەوەو ئالترناتیوی ئامادەکردوە.

کەوابوو نەتەوەو مافی نەتەوایەتی و کورد و کوردستان لە قامووس و سیاسەت و ئایینی ئەو ڕێژیمە دا نیە و نەنووسراوە. حکوومەتی ئیسلامیەو لە ئیسلامیشدا نەتەوە مەتەوە نیە و تەنیا "عیبادەت" و "خواناس" و ئیسلام هەیە و برایەوە.

٣- چەوتیەکی تر ئەم بۆ چوونە ئەوەیە کە خەبات و تێکوشانی میللەتی کورد دەبەسترێتەوە بە شەڕی دوو دوژمنی کورد و رووخان و سەرکەوتنی یەك لەو دوانە. واتە کز بوونی هیوا و هومێد بە خەباتی کۆمەلانی خەلك و حیساب بۆنەکردنیان. لە کاتێکا خەباتی هێزە شۆڕشگێڕەکانی کوردستان گەلێك بەر لە شەڕی ئێران و عیراق دەست پێکراوە و لەو خەباتەش دا هەر پشت بە کۆمەلانی خەلك بەستراوە.

٤- هەر یەك لەو ڕێژیمانە ئەگەر بمێننەوە و شەڕیش ببڕێتەوە، لە نێو خۆی ولات دا هەر ئەوەیان بێ دەکرێ کە ئێستا دەیکەن، ڕەنگە توزێکیش کەمتر. لام وانیە پاش شەڕ وەستاندن گیرو گرفت و تەنگ و چەلەمەی نێو خۆی ئەم دوو ڕێژیمە لە ئێستای سەردەمی شەڕ کەمتر بێ، ئەو هەموو خەلکەی ئێستا بۆ جەبهەکانی شەڕ دەبێچەك دراوە، بەشی زۆری دەگەڕێنەوە سەر کارو ژیانی ئاسایی و بەر لە بارو دووخی ولات و لە سیاسەتا دژی گەلی حکوومەتەکەیان دەکەنەوە.

ئەوە هەموو کەس و کار کوژراو سەقەت و نەقوستان و ئاوارە و مال ویران، هەر وەك سەردەمی شەڕ بێدەنگ نابن و چەپلە بۆ سیاسەتی ڕێژیم لێ نادەن. دیارە ئەو بەشە بەستراوەتەوە بە چالاکی وتێکوشانی هێزە سیاسیەکانی ئۆپۆزیسیون کە تا ج رادەیەك دەتوانن کاریان لەبە نێو دا بکەن و بۆ خەبات ئامادەیان بکەن.

دوور نیە کە ئەرتەشیش پشوبەکی بێتەوە بەر و بیر لەوە بکاتەوە کە هەیاران ئەم چەند سالە ئەم شەڕە بۆ کراوە و ئەم هەموو خەلکە بۆ بە کوشت دراوە؟

دیارە ئەو بۆ چوونە بەو مانایە نیە کە کەس دژی رووخانی ڕێژیمی سەددام بێ، ئاواتی هەموو نیشتمانپەروەرێکی کوردو غەیرە کوردی دیموکراتە کە هەر ئێستا بڕووخی و ئابووت و شرت و گوم بێ. لیرەدا تەنیا مەبەست ئەوەیە کە هێزە دیموکراتیەکانی کورد سیاسەتی خەبات و تێکوشانی خۆیان نابێ تەنیا لە سەر ئەو بۆچوونە دابنێن.

بەلای منەوە تەنانەت لە هەلگرتنی ئەو دروشمەش دا، یەکگرتنی هێزە شۆڕشگێرە- کانی کورد لە گەل هێزە دیموکراتیەکانی ولات لە ئێران و عیراق بارستەنگی جولانەوەی رزگاریخوازی کورد قورستر دەکا. *

## گۆشەی ئەدەب

### پەردە

**ئاشتی**

هەر بروانی،
ورد ورد چاوت دەشکێنن
نەکا وێنەی چەند جوانێکی هەلگرتبێ!
چاوەکانت - چاوی هەتاو -
لەژێر پەر دەی ئیشارەدا، بشارەوە!
با ڕۆژی خۆی، بەو چاوانە
دژی جوانی بسووتێنم.
* * *
هەر شل بێوم
بەند بەند با لاتێك ئەشکێنن
بەژنت لەژێر پەردەی جلکی خاکی رەنگا بشارەوە.
با ڕۆژی خۆی، بەو بالایە
سێدارە بۆ دژی جوانی دامەزرێنم.
* * *
هەر سەر رووت کەی،
ئاتا بسکت هەلدەپاچن.
بسکت لەژێر پەردەی جامانەدا بشارەوە.
با ڕۆژی خۆی، بەو بسکەی تۆ
سێدارە بۆ دژی جوانی دامەزرێنم.
* * *
بەلام، نەکەی دەست لە ژێر پەردە باوێی،
هەر چەند ڕۆژی سەد جار بلێی:
خۆشم دەوێی.
لە گەل دەست کارێك نایە،
چرویەکە نەیشکووتوە،
وەهەر هەموو چاوێك نایە.
* * *

هەواڵنامەی کتێب

ji r.1

# Kurd û Kurdistan

devokên tevgera Kurdî, nîv siyesî û nîv ronakbîr bûn. Ku ji rastiya tevgerê dûrbûn.

Di demê şerê duwemê cihanî de, tevgera Kurdî di destê rêkxirawa netewî ya borjuwa de bû (xweyîbûn). Lê piştî şerê duwemê cihanî, li şûna rêya çep partiya demokrata Kurdistanê (PDK) hate danan ku li Iran-Irak-Tirkiye û paşî li Soryê tayên xwe hebûn. Bi rastî ew partî Enyeke baş bû ji bo hevbûna hêzên niştîmanî û texên cuda cuda di nav civata Kurdî de. (P.D.K) rolek baş dît piştî şerê diwemê cihanî ji bo rêkxistina tevgera Kurdî di Iranê û di salên şêst û heftiyan de li Iraqê serokî partiyê Mistefa Barzanî bû ku jêhatiyê serkêşa tevgera Kurdî ye.

"Lazeriv" di nivîse:- Tiştê Ku di tevgera Kurdî de bala mirovî radikişe ewe ku di hemî parçan de ew pêşde çûye. Herwiha ew diyar dike Ku texa (çîna) karker û gurdî û şorişgêr serê xwe di civata Kurdî de hildaye.

Di dawiya egerên navxwe de (hundir) ew bawere çi zû çi nêzik, wê tevgera Kurdî bikevte destê hêza çep de j bona wergirtina mafên netewî.

## Egerên Derve:-

Ji ber wan sedemên li serî behs kirin, ji hemiyan pitir mesela Kurdî wê bibe pirsek navnetewî.

Di destpêka sedsaliya 19 û serê sedsaliya 20 an de ew pitir berçav bû, lê piştî şerê yekemê cihanî, ew pitir di têkeliyên navnetewî de serbixweyî ya xwe heye.

Di van şêst salên dawî de guhrînên baş bi ser de hatine. Paşî "Lazerêr" di bêje:- Piştî şerê duwemê cihanî, em dikarin sê sengeran (helwistan) diyar bikin di doza Kurdî de:- Yeketiya Sovyet - Welatên emperyalist, ji wan ji pitir Engliz û Ferensa - Welatên serbixwe yên devera naverast (Tirkiya û Iran).

Helwista Sovîyet herdem piştevanî bûye ji bona tevgerên netewî û sosyalizmê de. Sovyet pişta hindê diqire ku pirsa Kurdî bi şêwek demokratic û rast bête çareser kirin.

Helwista welatên Kolonyal li rojava berovajî wê çendê bûn. Dema Engliz û Firansa, Iraq û Sorya girtî, dixwest pirsa Kurdî ji bona fireh bûna Kolonyaliya xwe biden kar. Dixwest ew Kurdistanê ji xwe re bikin binkek ji bo gefa li sinorê jêrîya Soviyetistanê bikin.

Helwista rojava bi dewletên nû serbixwe bûyî de û tekilî bi pirsa Kurdî re, xizmeta wan dewletan Kiriye.

Giringî ya Kurdistanê di siyaseta naverasta Emrika de, di çavê stiratijîka eskerî - siyasî û abûrî de ye.

Rola Kurdistanê ji bo Emrika ne ber yek bû. Çunkî ew dewletên ku Kurdistan dinav de perçe kirî, ew bi hefsarê xwe ve di destê Emrika de bûn. Lewra Emrika ne pêtvî bû pirsa Kurdî bi gehte armanca xwe ya dawî. Lê dema aloziya siyasî devera asya rojava girt, Emrika giringîya Kurdistanê dixwest viyê pirsa Kurdî bike dardestê wan dewletan ji bo lêdana hevdu. Piştî şorişa 14 temozê, siyaseta Englîtera li gor pirsa Kurdî ji ya Emrika nêzik tirbû. Lê her dixwest ew çeperê xwe yê emperyalisti li deverê biparêze. Evro taybetiya berjewenda dewletên emperyalist li Kurdistanê alê abûrî digire. Di pilana nêzik û dûr ya dewletên rojava da ewe, ku pirsa netewî ya Kurdî û her pirseka din ya netewî di asiya rojavade. ji bo ragirtina tiraziya (mizan) barê eskerî - siyasî û abûrî. Di vir de xweya dibe:-

1- Piştgirtina bi şert bo hindek bizavên Kurdî Ku (ziyanê li rijêmên ne dost bide).

2- Hewildan ji bo bihêzkirina hêzên netewî yên rastrew û rakêşana wan berev rojava (nemaze yên ku ser bi beg, eşîretî û Kevne perestiyê ve).

3- Bikar anîna serûberê taybetî yê rojhilata naverast wek:-
Aloziya di nav cihana Erebî de. Milşorkirina Islamyan di welatên ne ereb de ji bo Israîlê (wek li Iranê).

Paşî "Lazeriv" dinivîse:-

Di Kakil de, Emrika û hindek dewletên rojava dixwazin alikariya pirsa Kurdî bikin. Lê ne ji bo gehiştin bi armanca xwe ya dawî de. Evro ew bi berjewenda wan re hev nagire. Çunkî ji ber rabûna texa şoreşgêr, şans kêm dibe ku Kurdistanek otonomik ser bi rojava ve peyde bibe. Di vir de diyar dibe ku siyaseta Emrika û herpeymanên wê li gor pirsa Kurdî bê asoye (bê pêşe roja).

Helwista Sovyet li gor pirsa Kurdî ne guhriye. Lê piştî şerê diwemê çihanî, hindek layên nû lê diyar bûne.

Eger Sovyetistanê berî şerê diwemê cihanî peywendiyên bi Tirkiyê û Iranê re li ser binaxa dostatî û ciranetî girêdabûn, lê ew du welat, Iraq ji pêre ketine di bazna Emrika de û li ser binaxa siyaseta dijî Sovyet ketine nav peymanên eskerî herdem dikarin Kurdistanê mina binkek eskerî li dijî Sovyet bikar binin. Bêgoman siyaseta Sovyet li hember pisa Kurdî dikevte ber pêwista jiyanê ji bona paristina sinorê xwe yê rojava û peywendiyên wê bi welatên rojhilata naverast ve.

Bêgoman pirsên deverê:- Mina pirsa Felestînê - Şorişa Islamî li Iranê - raperîna Kurdistana Iranê - barê abûrî li Tirkiyê û şerê Iraq, Iranê, ew hemî rolek mezin di wê de di binin û pitir aloz diken. Wê çendê pirsa Kurdî ji alekî ve mezin tir lê kire û ji alek din ve çend tayên din pêve kirine.

Nivîskar tibla xwe bo wê dirêj dike ku di siyaseta derve de wan deweletên ku peywendî bi pirsa Kurdî ve hene, alikariyê dikin ji bona bêdeng kirin û şewitandina serhildanên Kurdan.

Tev dewletên deverê dijminatiya xwe na veşêrin li hember dirûşma nasyonalizma kurdî (çi di Kurdistana serbixwe de, çi ji di Kurdistana otonomik de). Ew wan herdu dirûşman bi yek dinasin. Ew otonomî bi rêxweşker ji bo serxwebûnê dizanin.

Niha di siyaseta wan dewletan de, ji bo bikaranîna aloziya nav dewletan, çalakiyek berçav di be.

Lê guh na dite berjewendiya netewa kurdî.

Nivîskar siyaseta Şahê Iranê 1961-1975 li hember pirsa Kurdî dike minok (nimone) ku ji ber aloziya Iran-Iraqê li ser sinorê Şetalareb - Xozistan - ew bûn egera wê ku Iranê alikariya Kurdên Iraqê bike li dijî Iraqê. Lê dema ew pirs hatine çareser kirin, Şahî pişta xwe da pirsa Kurdan.

Dîsan nivîskar diyar dike ku di şerê Iran-Iraqê de herdu dewlet bi xwe feydey ji Kurdan diken. r. 3

Serdema Nû
TRYCK: ARARAT TRYCK
XWEDÎ: Dr. Cemşîd Heyderî
BERPIRSYAR& REDAKTOR: Kerîm Hussamî
Postgiro: 420 4506 - 2
ISSN 0284-3412
P.O.BOX 7066 16407 KISTA SWEDEN

